Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1216 27-Cotmeh-2024 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Omer Îshaq; Huner cîhaneke ji afrîneriyê ye

**Birûc Resûl/Qamişlo**

**Hunermendê Komêkis Omer Îshaq diyar kir ku pêwîste teşwîqkirina hunera xêzkirinê li herêmê bê kirin, herwiha divê ji bo perwerdekirina nifşan saziyên dilxwaz bên avakirin û got, "Kesên wênesaz dikarin bibin helbestvan û nivîskar jî."**

Hunermendê wênesaz Omer Îshaq ku pêşengê hunera 'Komêks e', bi hunera xwe ya wênesaziyê tê nasîn, herwiha raman û çîrokan bi rengekî balkêş xêz dike, di heman demê de di bûyerên taybet de jî pispor e.

**Kurtejiyana hunermendê Komêkis Omer Îshaq**

Omer Îshaq di sala 1957`an de li navçeya Amûdê ji dayik bûye. Omer bi hunera wênesaziyê ve girêdayî ye û ji ber ku di nava malbateke hunerî de mezin bûye, ji zaroktiya xwe ve derfetê fêrbûn û xwendinê li pêşiya wî hebû, ji ber vê yekê wî hunera xêzkirinê ji xwe re hilbijart, herwiha fêrbûyina xizkirinê ji xwe re kir armanc û bi heyecan û xwesteka xwe pir bi lez fêr bû, ji ber hebûna kesên ku di nava malbatê de ew fêr kirin û behreya wî ya afirîner di xêzkirinê de xurt bû. Lewra Fakulteya Hunerî ya Şamê daxwza Omer Îshaq kir ku tevlî Fakulteya hunerî bibe. Lê armancên Omer Îshaq ji wiha mezintir bû, ji ber vê yekê di sala 1988`an de li Zanîngeha Fransî 'Sorbone' fêrbûna hunera 'Komêkis' teorîk dît. Lê ji ber mijarên malbatê, xwendina xwe temam nekir û vegeriya welat.

**Hunermendê 'Komêkis' Omer Îshaq**

Gelek huner hene awayê xêzkirina wan bala mirov dikişîne, yek ji van hunerên balkêş ya komêkis e, ev huner di dinyayeke tijî afirînerî û jêhatîbûne, ji ber vê yekê hunermendê 'Komêkis' Omer Îshaq biryar da ku xwe bi vê hunerê re bike yek. Omer Îshaq dixwaze bi riya hunera xwe ya wênesaziyê de riya zarokan ronî bike, her wiha dema zarokek bibîne ku çîrokek bi awayekê hunerî hatiya xêzkirin, di heman demê de bi rengên cûr bi cûr û balkêş hatiya xemlandin, ew zarok xwe nêzî wê çîrokê dike û dûrî mediya dicîtal dikeve. Omer Îshaq ji sala 2021`an de, di Kovara Mizgîn a zarokan de karê wênesaziyê dike.

Derbarê hunere Komêkis de, Omer Îshaq ji Rojnameya me re axivî.

Omer Ishaq di destpêka axaftina xwe de balkişand ser mijarên ku bla zarokan dikşîne û wiha got: "Ez ji zaroktiya xwe ve ji hunera xêzkirinê hez dikim, ji ber ku ez di malbateke hunerî de mezin bûm, min birayê xwe yê mezin ji xwe re mînak girt, ji ber ku birayê min yê mezin di hunera xêzkirinê de zîrek bû, her tim ez ji bona hunera xêzkirinê dida teşwîq kirin û dihşit ku hezkirina min ji hunera xêzkirinê re zêde bibe. Li ser vî bingehî min gelek gavên mezin di fêrkirina hunera xêzkirinê de avêt. Birayê min di kesayeta min de îradeya temamkirina xwendina hunera xêzkirinê afirand û tim ji min re digot "Dema tu xêz bikî, ji min bihêztir û xurtir be.", lewma birayê min mamosteyê min ê yekem bû."

**Sûdên çîrokan**

Omer da zanîn ku zarok gelek sûdên erênî ji çîrokan digirin û wiha got:"Girîngiya çîrokan, ew e ku bi riya xêzkirinê çîrok were xêzkirin û nivîsandin wê demê xurtkirina perwerdekirinê li cem zarokan çêdibe. Herwiha ji bo zarokan xalên sereke hene, yek ji wan xurtkirina dîtinê ye ku meraqa xwendinê çêdike, dihêle ku ew çîrokê analîz bikin, eger zarok zehmetiyê bikşînin di warê xwendinê de, em bi riya xêzkirinê çîrokê hêsan dikin. Dema ez çîrokan bi riya xêzkirinê şîrove dikim, ez bi rengên ku bala zarokan tê kişandin reng dikim û dixemilînim, da ku ev zarok dûrî amûrên teknîkê bikevin û çanda xwendinê li cem wan pêşbikeve."

**'Hezkirina min ji çîrokên zarona re'**

Îshaq diyar kir ku hilbijartina wî ji bo xêzkirina çîrokên zarokan ji ber hezkirina wî ji şêwaza vê xêzkirinê û leza wê re tê û wiha pê de çû: "Xêzkirina çîrokên zarokan li gorî temenê zarok diguhere, zarokên ku temenên wan di navbera 12-16 salî be çîrokên




wan ne wek yên zarokên biçûke, ji ber zarokên biçûk bi tevgerin, min ji vê şêwaza xêzkirinê hez kir, ji ber ku bilez e, dema ku kombiyutr tune bû, min li ser kaxezê xêz dikir, lê xêzkirina li ser kombiyuterê hêsantir e."

**Tevlîbûna Omer Îshaq di pêşengiha şehîd Herekol de**

Ev 2 sal in ku Omer Îshaq beşdarî pêşengiha şehîd Herekol a pirtûkan dibe, her wiha di pêşengiha 7 û 8'emîn de cihekî pir girîng girt ku kêfxweşê dikir dilê her zarokekî de, her ku zarokek di bere derbas dibû rûkenî û dilşadî li ser rûyê wan xêz dikir. Di heman demê de beriya ku Omer Îshaq zarokekî di pêşengihê de xêz bike, ew kêfxweş dikirin, ji ber vê yekê Omer Îshaq her ku zarokek didît wê di demekî gelekî kurt de xêzdikir, ew dem jî nêzî 5-10 deqan de bû. Her wiha di pêşengihê de zarokan li dora Omer Îshaq kom dibûn û demên bi rehetî û kêfxweşî derbas dikirin.

**'Pêwîste em hunera xwe mezintir bikin'**

Omer Îshaq di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Pêwîste em hunera xêzkirinê li herêmên xwe teşwîq bikin û ji bo perwerdekirina nifşan divê saziyên dilxwaz hebin, ji ber ku huner xwedî hişmendiyeke mezin e, kesê ku boyax dike dikare bibe helbestvan û nivîskar, hişmendiya gelê xwe û pêşketina wan bi rêya hunerê derxe holê."



Sudoku: Bersiv 11

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 2 | 4 | 7 | 5 | 3 | 6 | 8 | 9 |
| 3 | 7 | 8 | 9 | 6 | 4 | 2 | 5 | 1 |
| 5 | 9 | 6 | 8 | 1 | 2 | 3 | 4 | 7 |
| 6 | 3 | 9 | 5 | 2 | 7 | 8 | 1 | 4 |
| 8 | 1 | 2 | 3 | 4 | 9 | 7 | 6 | 5 |
| 7 | 4 | 5 | 6 | 8 | 1 | 9 | 2 | 3 |
| 4 | 8 | 3 | 1 | 7 | 6 | 5 | 9 | 2 |
| 2 | 6 | 7 | 4 | 9 | 5 | 1 | 3 | 8 |
| 9 | 5 | 1 | 2 | 3 | 8 | 4 | 7 | 6 |

Sudoku:Pirs 12

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | 8 | | | 5 | 3 | 6 | |
| | | | | | | 2 | 7 | |
| 6 | | | | | 4 | 1 | | |
| 5 | | | | | 7 | | 2 | |
| 9 | | | 5 | 4 | 6 | | | 1 |
| | 6 | | 1 | | | | | 9 |
| | 9 | 2 | | | | | | 7 |
| | 7 | 6 | | | | | | |
| | 4 | 5 | 8 | | | 6 | | 3 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Bayek li ber guhê wî ketiye:**
- Tiştek çûye guhê wî lê baş fêm nekiriye; tiştin bihîstine lê baş nizane ka çi ye.
**Bêhnek li pozê wî ketiye:**
- Bi heman wateyê.
**Bêhna tiştekî hildaye:**
- Bi heman wateyê.
**Bi ser hisan ketiye:**
- Bi heman wateyê.
**Tiştek bi ber guhê wî ketiye:**
- Bi heman wateyê.
**Fihêtî ji nava me hilatiye:**
- Em li hev serbest bûne; em bûne weke bira.
**Li bayê serê xwe mezin bûye:**
- Bi serbestî mezin bûye; neketiye binê zeptûrepta ti kesî.
**Me rû ji hev standiye:**
- Em li hev serbest bûne; em bûne weke bira.
**Serî jê re berdaye:**
- Serbest kiriye; perwerde nake; bêperwerde mezin dibe.
**Banê me yek ban e, aliyek deşt e, yek zozan e:**
- Ti kes guhê xwe nade ti kesî; her kes weke xwe dike.
**Ban heman ban e, aliyek deşt e, yek zozan e:**
- Bi heman wateyê.
**Bizina beravêtî ye/weke bizina beravêtî ye:**
- Mirovekî belawela ye; ne birêkûpêk e; ne biserûber e; tiştên wî, derdorên wî ne li ser hev in; bêpergal e; li tiştên xwe xwedî dernakeve.
**Çawa saq e gore liyaq e:**
- Tiştên wî jî weke wî bêserûber in; tiştên wî jî weke wî nelehevhatî ne; tiştên wî jî weke wî ne.
**Dew û doşavê tevlîhev dike:**
- Tiştên ne di cih de dike; tiştên ku li hev neyên dike; tiştên bêserûber dike.
**Gêreya kûçikan e:**
- Bêserûber e; pir tevlîhev e; tiştek jê dernakeve; pir pîs bûye; mirov ji navê dernakeve.
**Guro bi lepê xwe ve:**
- Berdîberdan e; talan e; kî çi dixwaze dike.
**Mal li Hemka baneyî li Çemka:**
- Karê wî ne bi ser hev ve ye; karê wî pir belawela ye.
(Hemka û Çemka du gundên Elkê ne)

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Desthilatdarî û Rêveberiya Demokratîk...(2)



Li herêm û dayika niştiman a şaristaniya navendî kaosa mezin a pêk tê, ji her alî ve û eşkere nîşan dide ku parvekirina desthilatdarî û dewletdariya netewe bi binketine.**R-4**

## Nisrîn Abdulah: Sedsala 21'an sedsala azadiya jinê ye

Fermandara Yekîniyên Parastina Jin YPJ'ê Nisrîn Abdulah diyar kir ku heger jin parastina xwe li ser mêr û pergaala dewletê bihêle, wê demê ew jin mehkûmî mirnê ye û got; "Heger em nebin xwedî pergaleke xweparastinê, em ê nikaribin hebûna xwe misoger bikin."**R-2**




## Sosyolojiya ciwanan bingeha avakirina kesayeta ciwanên serdemê ye



Ciwantiya li ser bingeha bîrdoziya azadiyê û şoreşgertiyê hatiye avakirin, di piratîzekirina xebat û şoreşgertiya xwe de wê bi hîmên wê zanebûnê tevbigerin. Ciwanên Efrînê bi vê helwestê xebatên lêkolînê di nava jinên ciwan û ciwanan de aktîf dikin.**R-6**

## Ji çiraxên huner û wêjeya kurdî




Hunermend Elî Gavan çirûskeke ronake ku bi salan e pêta wê nayê vemirandin. Hunermend xwedî roleke girîngin di parastina mîrateya çandî û nasnameya neteweyî ya civakan de bi afirandina berhemên hunerî yên ku nûnertiya kevneşopî, bawerî û nirxên çandeke taybet dikin û nîşan didin.**R-7**



**Kurdistan Dergûşa Mirovahiyê Bû!**
Sîpan Şînda R-7

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye

Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1216 27-Cotmeh-2024 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# LI HEMBERÎ QIRKIRIN Û KOMKUJIYAN; BERXWEDAN

**Dagirkeriya Tirk di şeva 23'ê Cotmehê de careke din bi awayekî hovane dest bi êrişên qirkirinê yên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir. Dagirkeriyê di êrişên xwe de wekî her car binesaziya herêmê, mal û milkên welatiyan dike armanc. Di encama êrişên ku heta niha dewam dikin, bi dehan welatî şehîd û birîndar bûne, stasyonên elketirîk, petrol, gaz, û gelek cihên xizmetguzariyê hatin hedefgirtin û ji kar derketin.R-3**



## Dilyar Cizîrî: Ragihandina Azad hêza dildarî û rastiyê ye

Dilyar Cizîrî diyar kir ku Ragihandina Azad bi hêza civakê girêdayê ye, lê ragihandinên dîtir bi hêz pereyan ve girêdayî ne, herwiha xebatkarên ragihandina azad bi dildarî kar dikin, dibin mertalek li hemberî hêza desthilatdaran û di vê oxirê de 28 xebatkarên ragihandina azad xwe fedayî heqîqetê kirin.**R-5**



# Nisrîn Abdulah: Sedsala 21'an sedsala azadiya jinê ye

Fermandara Yekîniyên Parastina Jin YPJ'ê Nisrîn Abdulah diyar kir ku heger jin parastina xwe li ser mêr û pergaala dewletê bihêle, wê demê ew jin mehkûmî mirnê ye û got; "Heger em nebin xwedî pergaleke xweparastinê, em ê nikaribin hebûna xwe misoger bikin."

**Ronaz Silêman/Qamişlo**





Derbarê rola jin di nava qada leşkerî de û asta têkoşîna wê, yek ji Fermandarên Yekîniyên Parastina Jin YPJ'ê Nisrîn Abdulah bersiva pirsên rojnameya me da û hepeyvîn wiha bû:

**Çima sedsala 21'an bi sedesala jinê tê naskirin?**

Em çaxekî ji çaxê 21'an em li pey xwe dihêlin, ev çax zemanekî tê de gelek têkoşînên mezin ji bo rêzgariya cîhanî, çewre û mirovahiyê hatiye kirin. Herwiha di vê çaxê de, jin gihiştiye asteke bilind, bi deng û rengê xwe karî li her deverê têkoşîna azadiyê bide teysandin û bi xurtî kar û xebat ji bo vê yekê hate meşandin. Bi baweriya tesbîta ku Rêbertiya me çaxê 21'an kir çaxê Şoreşa Jin. Çaxê ku li hemberî bêwatebûna ku pergala desthilatdar dide pêşxistin, şarestaniya ku 5 hezar salan bi hişmendiya modernîteya kapîtalîst a ku ji hizrê zilam hatiye afrandin xwe dide jiyankirin, têkoşînên mezin jêr gerekin. Lewra li hemberî kiryarên vê hişmendiyê, jin têkoşîna xwe berdewam dike û helwesta xwe jî diyar dike, di heman demê de şoreşa jin îfadeyeke xwe pir bi şînber kir.

**Jinên kurd û bi taybetî YPJ'ê çiqasî dikarîbû li hemberî êrişan bibe xwedî helwest?**

Ruxmê hemû êrişên qirkirinê ku li ser jinê têne kirin jî em ê têkoşîna xwe berdewam bikin, ji ber dem ew deme ku em li hemberî vê zihniyeta qirêj têkoşîna xwe bilind bikin û em bêjin ev dema azadî û şoreşa jin ye. Di heman demê de zemanekî ku meşa azadiyê bi silogana "Jin, Jiyan, Azadî" hatiye destpêkirin û bi vê siloganê jî em îro şoreşa xwe birêve dibin. Me jî weke YPJ'ê xwest bi seknekî xurt tevlîbûna xwe ji pêngava jin û jiyan azadî ber bi şoreşa jinê ve, bidin çêkirin, da ku têkoşîna jin bighêje asta ku karibe bibe afrîneriya cîhan, jiyan û kesayetekî nû. Herwiha ji hemû dema zêdetir jî xwedî wê zanebûnê ne ku pêwîstî bi têkoşînekî girîng heye, ji ber ku şerê cîhanê yê 3'yemîn niha xwe dide nîşandan û teysandina xwe dike. Şerê cîhanê yê 3'emîn di hemû aliyan de tê kirin, bi rêka tewriyên kirîza û rêbazên wêna ji şerê newewî heta bighêje pêkanînên şerê taybet. Şerê cîhanê ji çewrê heta bighêje jin, ji okremî heta zagonan, ji demokrasî heta nirxên ojena komînan tê kirin û kirîzên giştî dane avakirin. Ev şerê li hemberî jin û civakê tê kirin. Em jî dixwazin di nav vê meşê de cihê bigirin ku dixwaze têkoşîna dijî rêliyalîta şerê cîhanê yê 3'emîn bilind bike û têkoşîna me di vê rewşa tevlîhev û di kirîz de çiqasî bi rêxistinkirî û aktîv be, ewqas em ê karibin serkeftinê bi dest bixin.

**Asta xweparastin çiqasî girîng e û rola YPJ'ê di vê yekê de çawa ye?**

Em jî weke YPJ'ê di nava hewldanekî mezin de ne, da ku karibin bibin hêzekî pêşeng. jin mil bi mil ala serkeftinê rake. Gelek alî şerê niha tê kirin, navê şerê cîhanê yê sêyemîn lê nakin, lê ev çaxekî têde ev şer tê meşandin û bi taybet ji sale 90'î û vir ve pir berbiçav teysandina xwe dide nîşandan, çiko êş û azarê wêna civak û jin jiyan dike. Em jî bawerin jin û civak di ferqa wê de ne, lewra hewldanên mezin di ortê de derdikevin. Ji ber ev 5 hezar sal in dixwazin hebûna jin bidin windakirin, hebûn û xwebûna wan ji dest wan bigrin û bi sîstematîk pilansaziyên qirkirinê li hemberî wan didin meşandin. Mînakê şînber jî: Şerê ku îro li Kurdistan û Rojava, li Sûriyê, Rûsiya û Ukraniya, Ermenistan û Ezerbîcan, Israîl û Hemas, Israîl û Lubnan tê meşandin, rewşa ku niha li Efxinistanê tê jiyankirin ku dijminatiya jin tê temsîlkirin. Derbeya leşkerî yên ku li di qata Efrîqiya de berdewam dike, rewşa ku li Amerîka Başûr tê jiyankirin, alîkî de rastigirên tundrew ên ku tên ser desthilatdariyan di welatan de, rewşa Iraq, Yemen û Sûdan jî, ji bû wê li kîjan alî meyze dikin koçberî, qetlam, qirkirin, binpêkirin, birçîbûn, nexweşî, weke encamên van kirîzan xwe didin encamdan, em di rewşekî wiha de jiyan dikin. Ci civak û ci jin ji hemû dema zêdetir pêwîste xwe biparêzin, bi taybet jî YPJ'ê di destpêka avakirina xwe de ev mijar bingeh girt. Heger em nebin xwedî pergalekî xweparastin, em ê nikaribin ne hebûn û xwebûna xwe bixin misogeriyê de.

**Dengvedana YPJ'ê di nava cîhanê de çawa pêk hat?**

Sala 2011'an de şoreşa Rojava hate destpêkirin, jin di nava hewldanekî mezin debû ku vê şoreşê bizîvirîne şoreşa jin û bi fedekarî, ked û têkoşînên mezin, karî di van milan de bibe xwedî sekin û helwest. Îro YPJ'ê di asta hêzên ji bû parastina jin, nirxê civakê û nirxên şoreşê ye, ev yek jî bi saya şehîdan û şervanên ku bûne sozdarên vê armancê. 13'e sal têkoşîn ji aliyê YPJ'ê tê kirin di qada xweparastin de. YPJ'ê rêxistin avakiriye û rehendên ku kar û xebat tê de daye meşandin birêxistin kiriye. YPJ'ê di felsefeya xweparastin de nexşeriyekî pir bi şînber, bi ezmûnên xwe ji hemû jinên cîhanê re diyar kir, ku jin bixistinkirinê kare xwe biparêze. Herwiha şert û mecên ku YPJ'ê têre derbas bûn, êrişên ku li ser hatin kirin, gelek êriş ji aqilê mêr çêbûn, lê sekna YPJ'ê bû bersiv. Ji ber xwediyê wê baweriyê ye ku heger xwe parastin neke, azadî û wekhevî pêk nayê. Sîstema desthilatdar û dewleta netew pir bi dijminî û hoveber bûne, ji ber êdî qada wî lê tê tengkirin, çiqast têkoşîna jin tê bilindkirin qada wê fireh dibe û ya mêr teng dibe. lewra bixweparastin jiyaneke azad were çêkirin, heger jin parastina xwe ji dewlet û mêr re bihêle, wê demê ew jin mehkûmî mirnê ye û em weke jinên kurd vê rastiyê bi deha baştir dizanin, ji ber jinên kurd êrişên dijminê derve û hundir dîtiye.

**Parastina jinê li hemberî hişmendiya mêr di çi astê de ye?**

Pêwîste em jin di ferqê de bin û ezmûnên xwe baş binirxînin, ji ber dîrokekî 5 hezar sal a têkoşîna jin heye, êşên me jî bûn ezmûn û li ser van ezmûnan bighêjin biryarên siberojê. Herwiha YPJ'ê ezmûnekî şînber a jine. Di heman demê de em nimûneyekî ku li ser pergalekî xweparastin a cîhanî ya jin bidin çêkirin, ji ber ji jinên gelek netewan di nava YPJ'ê de cihê xwe girtine. Di çarçova pernsîp û armancê hevbeş de têkoşîn dan meşandin. Aliyekî din de karî sîstema xwe ya xweser bide avakirin, di xweseriya xwe de xwe perwerde, rêxistin, pêşxistin û enalîzkirin bike, hem bi aqlekî hevbeş ê jin û civakî pilansaziyên xweparastinê pêş bixe. Li pêşiya serkeftina jinê kunên reş li pêşin, lewra divê bi hêz û îradeyek xurt van kunên han derbas bike û madem jin rêxistinkirîne divê di qada siyasî, leşkerî, çandî, civakî, perwerdehî, olî, hunerî û hwd… de kêm nemînin. Jin di nava xwede sînorên desthilatdariyê derbas bikin. Herwiha em xweparastin di gelek milan de digirin dest, heger me karî Neteweya Demokratîk li hemberî netewperestiyê pêş bixin xweparastine, îmana xweparastin li hemberî dînperestiyê xweparastine, pêşxistina jineolojî xweparastine, avakirina konfedralîzma demokratîk a jin xweparastine.

**Rêxistinbûyîna jinê çiqasî girîng e?**

Zanistiya jin a ku hatiye pêşxistin, îro di asta cîhanî de berbiçave, metirsiyeke mezin di sîstemên desthilatdar de pêşxistiye, lewra ev sîstem di nav hewldanên pêşxistina plansaziya de ne, ji bû jinan bikşînin saziyê xwe, bi taybet di van salê dawî de ev yek pir berbiçave. Îro roj jinan dikşînin artêşan, dikşînin qadê desthilatdariyê, wek Amerîka dixwaze serokê xwe jinekî hilbijêre bi vî rengî jinê dikşîne nav pevçûna desthilatdariyê. Hikumet û partiyên rastgir, nato dixwaze jina bikşîne nav xwe, armanc ew e têkoşîna azadiya jin qelis û bêwate bike, modêleke nû bide derxistin û bikevin bin xizmeta xwe ya hegemonîk de, da ku li gorî bejewendiyên xwe bikar bîne, ev yek jî di çarçoveya istratîcîk tê meşandin, lê ev nabe zemîna parastin jin. Dixwazin her tiştî bi destê jinê bidine kuştin. YPJ'ê bi xwe jî di nava lêhûrbûneke wiha de ye, lê divê em ji vê yekê agahdarbin, eltirnatîva xwe ji bo avakirina sîstema konfedralîzma demokratîk a jin deyne hole. Pêwîste jin di her qadî de birêxistinkirî be, da ku parastina xwe bike.

**YPJ'ê 13 sal ji têkoşînê li pey xwe hiştiye win vê yekê çawa dinirxînin?**

Pêşxistina sîstema demoratîk a jin li cîhanê di çarçoveya istratîciyeke xurt pêwîste, bi vî rengî em dikarin pêşeroja jiyaneke bi ronahî pêş bixin. Lewra di destpêka avakirina xwede wek YPJ'ê me got em dîroka xwe binivîsin û çarenûsa xwe diyar bikin. Pêwîstiyên me bi raperîna jin jî heye, ji bû avakirina sîstema demoratîk a jin. Şoreşa jin dengê xweşbûnê ye, azadî û hizkirina raste, dengê jiyana hizûre em jî wek YPJ'ê di nav vê şoreşê de her tim bibin parçeyek ji hêza afrîneriya van têgehan.



# Ji çiraxên huner û wêjeya kurdî

**Can Yûsif**



Hunermend Elî Gavan çirûskeke ronake ku bi salan e pêta wê nayê vemirandin. Hunermend xwedî roleke girîngin di parastina mîrateya çandî û nasnameya neteweyî ya civakan de bi afirandina berhemên hunerî yên ku nûnertiya kevneşopî, bawerî û nirxên çandeke taybet dikin û nîşan didin, ew bi hunera xwe dibin alîkar ku cewhera dîrok, adet û nirxên civakê were girtin û parastin û ev yek dibe sedema misogeriya ku mîrateya çandî ya civakê winda nebe û ji nifşekî bo nifşê were veguheztin.

Dengbêj û hunermendên Kurd di serdem û dehsalên curbecur de derketine, di warê muzîka Kurdî de şopeke bêhempa pêk anîne û têkoşîn kirine ji bo dewlemendkirin, belavkirina wê û parastina nasnameya neteweyî ya civaka Kurdî de. Hunermend Elî Gavan yek ji wan hunermendên Kurd e ku di nava çil salan de bi stranên xwe yên xweş û bi awazên xwe yên şêrîn, bê westandin û rawestandin, heta roja me ya îroyîn nasnameya çanda Kurdî û hunera kurdî ya resen parastiye, wî gelek stranên folklorî, netewî û şoreşgerî pêşkêş kirin e, pê pirtûkxaneya hunerî ya kurdî dewlemend kiriye.

Hunermend û stranbêjê navdar ê Kurd Elî Gavan li gundê Gir Zerkê yê girêdayî bajarê Dêrika Hemko li Rojavayê Kurdistanê, bajarê hezkirin û aştiyê, bajarê aramî û biratiyê, wargehê zanist û çandê, dîdargeha hunermend û helbestvanan di 1/1/1960'î de ji bav û dayikek Kurd (Mihemed û Bendê) hatiye dinyayê. Ew di nav malbateke kurdperwer, welatparêz û xebatkar de mezin bûye, ku ji welat hez dikir û bi nirxên kurdayetî ve girêdayî bû. Malbata hunermend Elî Gavan ji deh zarokan (pênc kur û pênc keç) pêk dihat ew yê herî mezin bû di nav xwişk û birayên xwe de, ku deriyê mala xwe ji tevgera rizgarîxwaza Kurdistanê re di salên heştêyî yên sedsala borî de vekir û ji bo azadî û rizgariya Kurdistanê her tiştên giranbuha û bi nirx pêşkêş kiriye.

Ji ber şert û mercên zehmet ên aborî û jiyanê ku malbata wî têre derbas dibû, şansê wî tinebû ku xwendinê bike wek hevalên xwe yên din, lewma di destpêka ciwaniya xwe de di karên zehmet de dixebite ji bo dabînkirina debara jiyana malbata xwe û pêkanîna pêdiviyên wê yên rojane, lê wî serî li ber qederê neçemand, lewma bêyî ku bikeve dibistanan, bi serê xwe fêrî nivîsandin û xwendinê bû bi her dû zimanên Kurdî û Erebî bû. Elî Gavan stranbêjekî kurd ê pir navdar e, xwedî cemawerekî mezine, belkî tiştê ku vî hunermendî ji yên din cuda dike ew e ku jêhatîbûna wî ya mezin di pêşkêşkirina stranan de bi awayekî ku dilan geş dike û hestan xweş dike. Meyla wî ya hunerî û hezkirina wî ya ji bo stran û muzîka kurdî di temenekî biçûk de, di deh saliya xwe de destpêkiriye û fêrî bikaranîna bizq û tembûrê bûye.

Hunermend Elî Gavan di sala 1982'an de zewiciye û bavê heşt zarokan (du kur û şeş keç) e. Wî di sala 1979'an de dest bi xwepêşana (mesîra) xwe ya hunerî kiriye bi stranbêjî û ahengan di şahiyên neteweyî, pîrozbahiyên herêmî û dawetên gelêrî de, ji xeynî hunera wî ya di dengbêjiyê de, ew xwedan şiyaneke nivîsandina stranên kurdî û çêkirina stiranan li ba wî heye, ji navdartirîn stranên wî jî ev in:

1-Şêrên Kurdistan
2- Kanya şehîdan Dêrika rengîn.
3-Şengal
4-Kulek di dilê min de ye.

Bi stranên xwe piştgirîya gel û civakê dikir, neheqî û zordarî rexne dikir û ji ber vê yekê di nav gel de hijmekar û navdar bû, ji ber ku wî bi stran û hestên xwe dengê wan temsîl dikir. Elî Gavan bi sekna xwe ya li ser sehnê, bi zîrekbûna xwe ya hunerî navdar e û piraniya stranên wî ji gotin û awazên wî û gotinên helbestvanên herêmê yên wek: (Diljan Cûdî, Ebû Fener, Lorî Tildarî, Îsmaîl Lalê, Rêzan Şêxo, Dildarê Mîdî, Bêwar Dêrşewî, Evdî Çaço ,Cuma Êrisî, Ereb Horê, Enwer Naso û helbestvanên din ên kurd in).

Ji stranên wî yên herî navdar evin:

1-Serî Tu Hilde Dêrika Rengîn: Gotin "Diljan Cûdî ", awaz "Elî Gavan."
2- Roj Êvare: Gotin "Melvan Resûl " awaz "Arif Sagh".
3-Rabe Ser Xwe Ey Şêxê min, gotin "Bavê Fener ", awaz "Elî Gavan."
4- Ezê Her Bêjim ji Dêrika Xwe re: Gotin "Bêwar Dêrşewî", awaz "Elî Gavan"
5-Çi Eywane Me Avakir: Gotin" Dildarê Mîdî, awaz "Elî Gavan".
6-Haval Harûn: Gotin û awazên Diljan Cûdî.
7-Sozdar Dengê Te: Gotin û awazên Diljan Cûdî.
8-Sînem: Gotinên Lorî Taldarî, awazê Elî Gavan.
9-Ho Ho Çemê Dîcle: Gotinên Dildari Mîdî, awazê Elî Gavan
10-Soniya: Gotin û awazên Rêzan Şêxo
11-Dunya: Gotin û awazên şehîd Haşim Keleş (Aydin)
12-Sebha Te Bi Xêr: Gotin û awazên Enwer Naso .
13- Hevalno Em Bi werene Bi dil û Can: Gotin û awazên Enwer Naso.
14-Cejne li Cîhanê: Gotinên Ebdulezîz Heso û awaz ji aliyê Elî Gavan.
15- Keziyê Yara Min: Gotinên Mehsûm Seyîd Haşim û awazê Elî Gavan.
16- Kulîlka Min Reng Esmere: Gotin " Lorî Taldarî" û Awaz "Elî Gavan."
17- Li ber Dilê Min Tu Pîrekî Ciwanî: Gotin "Îsmaîl Lalê û awaz ji aliyê Elî Gavan ve.
18-Şêran Berxwedan: Gotin "Reşîd Mela Elî", awaz ji aliyê Elî Gavan ve.
19- Evînê Em Kuştin: Gotin û awazên" Cûma Êrisî"
20-Jîn Çiye Ronî Nebe : Gotinên Xelîl Ebû Yezdo, awaz "Elî Gavan."
21-Meyzî Li Memşa Van Zeryia: Gotin " Ereb Horê, awaz ji aliyê Elî Gavan ve.
22- E diburim Şeva Tarî: Gotin " Ereb Horê" û awaz ji aliyê Elî Gavan ve.
23-Silav li te û doza te:Gotin û awazên Diljan Cûdî.
24-Newroz: Gotin "Evdî Çaço", awaz "Elî Gavan."
25- Birîndarim Dax di dilim:Gotin "Evdî Çaço", awaz "Elî Gavan."

Ji bilî stranên wî, çend kilîpên wî yên hunerî hene, ku yên herî navdar ev in:

1-Her Bijî Efrîna Dalal: Gotin û awazên hunermend Mihemed Elî Şakir
2-Ezê Her Bêjim ji Dêrika Xwe re: Gotinên Bêwar Dêrşewî û awazên Elî Gavan.
3-Kulek Di Dilê Min Deye: Gotin û awazên Elî Gavan
4-Dunya:Gotin û awazên Ş: Haşim Keleş (Aydin).

Li gel gelek hunermend û dengbêjên Kurd ên mezin ji koma Berxwedan li Ewropayê beşdarî ahengên netewî û şahiyên niştimanî bûye, wek: (Xelîl Xemgîn, Diyar Dêrsim, Şemdîn, Seyîdxan, Comerd, Bengî Agirí Peywan...hwd.) Elî Gavan kesayetiyek hunerî ya mezin e û bejneke neteweyî ya bilinde, hunermendek bi dengê xwe yê çiyayî navdar e ku hemû guh û çêjan kêfxweş dike, ew bi stranên xwe yên folklorîk û şoreşgerî navdar bû, heta ku bû yek ji navdartirîn hunermendên Kurd li Rojavayê Kurdistanê bi rêya stranên xwe ku îro ji aliyê zarok û mezinan ve têne gotin, berhemên wî di têkoşîna azadiya gelê Kurd de rolek zelal û pir girîng lîstine .

Di destpêka gera xwe ya di cîhana muzîk û stranbêjiyê de rastî gelek zehmetî û astengiyan hat û gelek êş û riswa dît û di salên heştî û notî yên sedsala borî de gelek caran li ser textê sehnê rastî lêdanê di hat ji hêla zarokên gelê xwe ve. dema ku di dawet û şahiyan de stranên netewî û şoreşgerî digotin û pesindana şoreşger û şehîdên azadiyê dikirin ji ber cudahiyên fikr û ramanên xwe û girêdanên xwe yên partîzanî, lê wî karîbû bi biryardarî û îradeya xwe rêya xwe bişopîne û li ber xwe bide, ji ber helwestên xwe yên niştimanî ji aliyê rêjîma Sûriyê ve hat bin çavkirin û girtin û rastî gef û îşkenceyan hat, lê xwe radest nekir û serî netewand û karê xwe berdewam kir û gelek stranên rengereng derxistin û 17 albumên muzîkê tomar kirin. Di navbera evîn, jiyan, şoreş, berxwedan û yên din de, wî ji bo şoreş û azadiyê, ji bo welat û xwezayê, ji bo evîn û jiyanê stran digotin, her wiha ji bo lehengên Kurdistanê û şehîdên azadiyê, ji bo sembolên welat û berxwedanê jî distrande . Heta niha zêdetir ji dused stranên netewî, şoreşgerî û dildarî (romantîk) pêşkêşî pirtûkxaneya hunerî ya Kurdî kiriye, hîn jî berdewame bi danê di karê xwe yê hunerî bê rawestandin û westandin.

Wî bi stranên xwe yên hêja û bi awazên xwe yên xweş hunera Kurdî dewlemend kiriye û karîbû hebûna xwe di nav civata hunerî û stranbêjiya Kurdî de bi layiqî îsbat bike û navê xwe li ezmanê hunera Kurdî û stranbêjiyê bi tîpên zêrîn binivîsîne .

Ji wî re tendurustî, serkeftinên zêdetir, afirînerî û ronahiyê dixwazim.



## Kurdistan Dergûşa Mirovahiyê Bû!

**Sîpan Şînda**

Di dîroka mirovahiyê de hinek cih û war hene ku ji bo mirovahiyê gelek girîng in, ji ber ku mirovahî li wan cihan kemilîye û çand, zanist, huner û hemî tiştên girêdayî şahristaniyê ji li wan cihan hatîne peyda kirin û dîroka mirovahiyê jî bi saya serê wan cihan hatiye zanîn.

Yek ji van cihan jî warê qedîm, warê verêj, warê bereketê, warê ku sererd û einerdê wê tijî zêr, neft û hemû cureyên mehdenan Kurdistan e. Warê biratiyê, warê, xweşbînîyê, warê bihev re jiyanê, warê parve kirinê, warê dostaniyê, warê tirbêtiyê, warê netew, çand, olên cihê ye Kurdistan. Warê payîzokan e, yê serêliyan e, yê heyranokan e, warê bendên bi şevan xilas nedibîn e, warê çîr û çîvanan e, warê evînê ye Kurdistan. Erê warê evînê ye Kurdistan. Warê Mem û Zînê, Dewrêş û Edûlê, Sînan û Sakînê ye. Lê îro? Belê îro bûye warê bişavtinê, tinekirinê, qetil û xwînê, qirkirinê… Mixabin, ev welatê cihê biratiyê, dostanîyê, tirbêtîyê, kirîvtiyê, hev re jiyanê… ev sed sal in tê talan kirin, wêran kirin, qir kirin. Ev sed sal in qetil û xwîn ji vî welatî xilas nebûye. Dagirkeran her tiştên xweş û baş, her tiştên sebra mirovan pê dihat, her tiştên çavên mirovî pê vedibî, dilê mirovî pê geş dibû, giyanê mirovî pê mest û rihet dibû li vî warî qir kirin.

Belê her çend Kurdistan dergûşa mirovahiyê bû jî, lê hema bêje îro çi şûnwar ji wan netew, ol û çandên kevnar yên li vê xaka pîroz nemane. Ji ber ku ji destpêka sedsala bîstan û pêve bi awayekî sîstematîk dest bi qirkirina hindik netew û olên cuda hate kirin. Mînak Ermenî, Asûrî, Suryanî, Keldanî, Aramî, Cihû ji van netewên li Kurdistanê dijiyan bûn. Di fermana filehan (weke xeyrî muslim dihatin binav kirin!) ya di sala 1915 an de, êdî ev netew bi awayekî sîstematîk ji cih û warên xwe hatin dûrxistin. Bi taybetî ji Ermenî û Cihû bi awayekî sistematîk hatin koçber kirin û ji cih û warên xwe hatin derxistin. Jixwe netewên weke Keldanî, Asûrî, Sûryanî û Aramî hindik mabûn, di fermana 1915'an de hema bêje qira van netewên henê anîn. Piştî ku pişta wan hate şikandin, hemû hatin koçber kirin yan jî qirkirin, paşê jî dor gihabû Kurdan. Jixwe Kurdên Êzidî jî para xwe ji fermana 1915'an standîbûn û ew jî tar û mar kiribûn. Eve sed sal in ev pergal li Kurdan dide û li ber xwe dide ku Kurdan jî weke van netewên din lê bike û ji halê rake, yan jî bide koçber kirin. Lê belê ji ber ku hejmara Kurdan zêde bû û Kurdan liberxwe jî dan, nekarîn bigihên armanca xwe. Lê mixabin di warê bişaftina çandî, zimanî, mejî, giyanî de gihane armanca xwe. Ne çi netew, ne çi çand, ne jî çi olên cuda li dergûşa mirovahiyê de hêlane. Di landika mirovahiyê de êdî ne dengê loriyan tê, ne civatên bi tirbêt û kirîvan têne geradin, ne pîroz kirina cejnên olên cuda mane. Tenê xwîn û girî, qîr û hawar maye li dergûşa mirovahiyê de. Her çend îro bextê xaka pîroz reş e û dewlemendiyên wê kêm jî bûne, lê hêvî nayêne qut kirin ku rojekê aştî û aramî bête vî warê pîroz.

# Sosyolojiya ciwanan bingeha avakirina kesayeta ciwanên serdemê ye

Ciwantiya li ser bingeha bîrdoziya azadiyê û şoreşgertiyê hatiye avakirin, di piratîzekirina xebat û şoreşgertiya xwe de wê bi hîmên wê zanebûnê tevbigerin. Ciwanên Efrînê bi vê helwestê xebatên lêkolînê di nava Jinên ciwan û ciwanan de aktîf dikin. Endama Navenda Lêkolînan ya Ciwanan Rîm Dede anî ziman ku rihê pêşengên ciwantiya Apoyî vejîn dikin.

**Zana Roj/ Şehba**

Tevgera Azadiya Kurdistan bi pêşengtiya ciwanên serdemê yên ku li ser rastiya dijmin û doza azadiya Kurdistan çavên xwe vekirine hate avakirin. Di nava vê tevgera ku weke lehiya herikî ye û diherike, pêşengtiya vê tevgerê ciwanan kir. Bi vê lehiyê re bi hezaran ciwanên Kurd û yên azadîxwaz ji hemû pêkhate û netewan cihê xwe tê de girtin. Tevgera Apoyî hemû gel û ciwanên Kurd yên welatparêz û sampatîzan di nava xwe de hewandin, bi taybet di pêşengtiya vê yekê de ciwanên xwedî zanebûn û xwendevan cihê xwe girtin. Li ser van bingehan ev tevger bi tevgera ciwanan tê naskirin; ciwanên ku bi herikîna serdemê re diherikin û dibin hêza guhartin û veguhartinê.

Tevgera Ciwanên Şoreşger avakarê kesayeta şoreşgerê serdemê ye, kesayeta ku xwedî helwest, îrade, vîn, zanebûn û ji şoreşgertiya xwe re hunermendiyê bike ye. Erk ewe ku ev hîmên bingehîn bibin yek û di kesayeta şoreşgerê demê re yê ku di şexsê tevgera ciwanên Apoyî de tê teysandin; bibe yek û xwedî li nasnameya xwe derbikevin.

Li ser van bingehan Tevgera Ciwanên Şoreşger yên Sûriyê xwe birêxistin dike û di hemû qadên civakê de pêşengtiyê dike. Di vê pêvajoyê de ji bo aktîvkirina xebatên bîrdozî, lêkolîn, analîz û xwendin di nava ciwanan de, li Kantona Efrîn û Şehbayê Tevgera Ciwanên Şoreşger dest bi xebatên lêkolînanan kirine. Ev xebat di çarçoveya lêkolînkirina gelek mijarên giran yên girêdayî ciwan û jinên ciwan de herî zêde tên gerandin. Têkildarî vê komîteyê û xebatê ku têne kirin Endama Navenda Lêkolînan ya Desteya Ciwan û Werzîşê li Kantona Efrîn û Şehbayê Rîm Dede ji rojnameya me re axivî.

**Pêşxistina ciwanan di aliyê zanistî û îdeolojîk de**

Rîm di destpêka axaftina xwe de armanc ji vê xebatê çi ye anî ziman û wiha got: "Li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêşxistina xebatên lêkolînan ya ciwanan hate destpêkirin, li herêma Şehbayê jî yekem car ev navend tê avakirin. Ev xebat me ji heyva Gulanê de destpê kiriye û xebatê wê têne meşandin. Bê guman di nava ciwanan de ev gavekî nû û tecrûbeyekî nû ye ku bi sîstem dikeve meryetê ye. Armanca me ya sereke pêşxistina ciwanan di aliyê zanistî, îdeolojîk, bîrdozî û xwegihandina hemû mejiyên ciwanên heyî ye, zêdetir nîqaşkirin û lêkolînkirina pirsgirêkên ciwanan bi taybet ji bo ciwanên Efrînê yên ku rû bi rûyê zehmetî, şert û mercên koçberiyê re dimînin e. Bê guman ev navend di nava xwe de hemû ciwanên ku di herêmê de dimînin digire nava xwe, weke gavekî nû ye, lê pêşwazîkirina vê gavê bi awayekî erênî hatiye teysandin".

**`Li hemder êrîşên ku têne kirin avakirina vê navendê; Bersîvdayîn e`**

Rîm bal kişand ser girîngiya avakirina vê navendê û birêvebirina vê xebatê di nava ciwanan de û wiha pê de çû: "Her çiqas em hewil bidin ku em bi rewşa koçberiyê û polîtîkeyên ku li ser me têne ferizkirina bandor nebin, helbet em kêm dimînin. Îro dijmin û hevkarên xwe bi hemû hêza xwe siyasetên xwe yên asîmîlasyonê li ser me dimeşîne û herî zêde ev siyaset li derdor ciwan û jinên ciwan têne gerandin. Dema em li kesayet û asta ciwanan dinêrin ev yek yekser tê xuyakirin. Bêhtir xebatê ciwanan bi çalakî, ka û barên rotîn tên naskirin, lê bê guman hêz û enerjiya ciwanan zêdetire û dikare diyarde, pirsgirêk û polîtîkeyên ku tên dîtin binirxîne, nîqaş bike û bibe hêza çareseriyê. Ji lewra avakirina vê navendê weke bersîvdayîneke li hember hemû êrîşên ku li ser ciwanan têne kirin e".

Modernîteya Kapîtalîst avakirina ciwanekî vala hedef dike

Her wiha Rîm bal kişan ser siyasetên ku li ser ciwanan têne meşandin û wiha got: "Di serdema heyî de dijmin û hêzên hegemon şerên gelek zirav li ser ciwanan bi taybet didin meşandin, li hember enerjî û herikîna ciwanan di giştî cîhanê de dibin bend, bê guman ev bend bi siyasetên şerên taybet bi xetên xwe yên zirav têne pêkanîn û ciwanan didin mijûlkirin. Ji mijûlkirina ciwanan zêdetir dixwazin mejiyekî sade, naverokekî vala û kêrnehatî bidin avakirin. Bi hemwextiya vê yekê re ku ev sîstem bûye sîstemekî gilobal û li ser ciwanan tê meşandin, bi taybet ji bo ciwanên Kurdistanê dijmin siyasetên herî xirab li ser wan dide meşandin. Di giştî Kurdistanê de hêza ciwanan tê hedefgirtin û weke ku me anî ser ziman bi polîtîkeyên şerê taybet yên weke sîxurtî, madeyên hişbir, teşwîqkirina koçberiyê û welat terkandin têne kirin. Ciwanên Kurd divê di ferqa van siyasetan de bin û li hember wê xwebirêxistin bikin. Yek ji erkên me yên bingehîn ewe ku em van siyasetan teşhîr, lêkolîn û nîqaş bikin û asta bandora wê bi civak û ciwanan re parvebikin".

**Naskirina Sosyolojiya Ciwanan**

Rîm di berdewamiya axaftina xwe de mijarên ku hatine lêkolînkirin anîn ziman û wiha got: "Di destgirtina me ji lêkolînên têkildarî ciwanan re, yek ji xisletên herî sereke ku me xwestiye em xwe li ser perwerde û lêkolîn bikin ew jî Sosyolojiya Ciwanan bû; çima me bi vê yekê re destpêkir ji ber rewşa ciwanan û mijarên ku em lêkolîn bikin hemû xwe dispêrin vê yekê. Weke gavên destpêkê me xwest pênesayeke gelemperî di asta cîhanê de bigrin dest, her civakak ciwanan çawa dibîne. Weke beşa duyemîn di cîhanê de pêşengtiya ku ciwanan kiriye, asta pêşketina zanistî ya ciwanan çi ye, bandora sîsteman li ser ciwanan û hwd. Di dawiyê de weke çareserî çi ye û emê çawa van pirsgirêkan derbas bikin û xwe avabikin.

Di berdewamiya mijarên ku me lêkolîn kirine de ev bûn; yek ji tîpên ku xwe li ser ciwanan ferizkiriye û tê dîti bê hêvîtiya ciwanan e. Bi taybet li vê herêmê her ku temenê koçberiyê dirêjtir dibe her ku ciwan dikevin piskeolojiya bê hêvîtiyê. Ê ji bo ciwanekî Kurd ev rewş bê guman nayê qebûl kirin û divê bikeve ferqa xwe û erk û berpirsyatiyên ku ji wî têne xwestin çi ne bizanibe.

Di heman demê de mijarên xwekuştinê ya ku herî zêde di nava jinên ciwan de pêşdikeve, li aliyê din ve mijarên zewaca temenê biçûk, bikaranîna madeyên hişbir û hwd. Ev mijar divê bi şaxên wê yên zirav bêne lêkolînkirin û awayê parvekirina van mijaran bi ciwanan re bê guman girînktir e. Helbet ev siyaset ji aliyê sîstemên cîhanî ve têne birêvebirin, ji lewra mijara Sosyolojiya Ciwanan û naskirina cewherê ciwantiya ku Rêber Abdullah Ocalan behs dike divê ku çawa be, kesayeta ciwananên demê divê çawa be, hemû li derdorê vê mijarê têne zivrandin û çareserî jî bi îdeolojiya Rêber APO pêkan e".



**Pirsgirêk, encam û çareserî bi ciwanan re parvekirin**

Rîm awayê parvekirina van mijaran bi ciwanan re anî ziman û wiha domand: "Em derbasî nava hemû beşên ciwana bûn, xwendekar, ciwanên sivîl, ciwanên kedkar. Gelek mijarên ku me anîne ziman bi wan re hatin nîqaş kirin. Di van xebatan de tê diyarkirin jêdera diyardeyên ku di nava ciwanan de diteyisin ji ku tê û xwe disipêre çi. Li ser van bingehan di encama lêkolînkirina rewşa ciwanan, riya çareseriyê çi ye tê diyarkirin. Encamên ku hatine derxistrin bi riya panêl û perwerdeyan bi ciwanan re hatin parvekirin û wê berdewam be".

**`Wê ev xebat di asta herêmê de sînordar nemîne`**

Rîm di dawiya axaftina xwe de pilansazî û pirojeyên demên pêş parve kirin û wiha got: "Bê guman xebatên me wê tenê di asta herêmî de sînordar nemîne, gelek tevgerên ciwanan yên cîhanî hene armanca me xwegihandina wan tevgeran û xebatekî hevbeş bê derxistin e. Li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê wê xebatê berfirehkirin û hemû ciwanên di civakê de hembêzkirin, her wiha wê yekemîn panêla piratîkî ya Navenda Lêkolînên Ciwanan bê lidar xistin ew jî wê li ser mijara Sosyolojiya Ciwanan be".

# 'Heya dawiya jiyana xwe em ê li ber xwe bidin'

**Ayşa Silêman/ Qamişlo**

**Dayîka şehîdan Zelîxa Mihemed diyar kir ku ev 5 salin dewleta Tirk a dagirker Serê Kaniyê dagirkiriye lê em ê heya dawiya jiyana xwe li ber xwe bidin û tucarî serî li hemberî dagirkeriyê natewînin, heya dilopek xwîn di canê me de heye em ê têkoşînê bikin û vegerin cih û warê xwe û xaka pîroz ji dagirkeriyê re nehêlin.**

Zelîxa Mihemed temenê wê 60 saliye xelkê Serê Kaniyê ye lê di Kampa Telai ya girêdayî bajarê Hesekê de ew û zarokên xwe bicih dibin. Piştî ku dewleta Tirk Serê Kaniyê dagirkir, ew neçar bû ku dev ji bajarê xwe berdan û berê xwe bidin cihekî bi ewlehî û ev nêzî 6 sala ye di kampê de jiyan dikin. Zelîxa Mihemed him bi Saziya malbatên şehîdan re û bi hêza cewherî re dibe alîkar. Tevî mezinbûna temenê wê jî, lê çi erk were ser milê wê dike, ew ji malbateke ku 23 Şehîd dane û tucarî qebûl nake ku di mal de rûne û wê hertim li ser piya be û li ser şopa şehîdan be.



Di derbarê salvegera dagirkeriya Serê Kaniyê û êşa derketina gel ji warên wan dayîka Şehîdan Zelîxa Mihemed ji Rojnameya me re axivî.

**Çîroka destpêkirina şerê Serê Kaniyê**

Zelîxa Mihemed diyar kir ku destpêka şerê Serê Kaniyê ji piçûkan heya mezinan şer li dijî çeteyên bi navê Artîşa Azad û çeteyên bi navê Cebhet EL Nusra dikirin û tu kes ji mala xwe derneket û gel karî wan têk bibe û wiha got: "Dema dewleta Tirk bi balafiran dest bi êrîşan kir êdî çara nema em koçber bûn, dema em koçber bûn me berê xwe da Til Temer û li wir bi cih bûn û ev nêzî 6 sale em li kampa Telai bi cih bûne. Lawekî min li Serê Kaniyê şehîd ketiye û lawê min yê din jî li Holê fermendarê tugayî bû, lê ev 6 salê wî ye windayî ye tu agahiyên me jê nîne, hesreta min ew e ku agahîyekî li ser lawê xwe nasbikim, her wiha du lawên min jî birîndar bûne. Bûyera herî bi êş ku me cih û warê xwe ji çeteyan re hişt, ez ji malbata 23 şehîda me û ne poşmanim ku malbata min canê xwe fedayê vê axa pîroz kiriye, heya ku dilopek xwîn di canê me de hebe em ê vegerin li warê xwe û tu carî em serê xwe natewînin ji dagirkeran re, em neviyên xwe jî ji bo parastina vê civakê û axê xwedî dikin."

**Astengiyên ku rastî wan tên di kampê de**

Dayîka Şehîdan Zelîxa Mihemed axaftinên xwe bidawî kir û wiha got: "Astengiya ku em rastî wê tên di milê demsala zivistanê de ye ji ber ku jiyana konan debar pêre nabe, zarokên me ji ber sir û seqemê gelek nexweş dikevin. Hêviya min serkeftina hêza me ye û vegera me ya li warê meye. Dewleta dagirker bang dike bi dînê islamê lê rojane sûcên dijmirovî dike zirarê dide herderî heya xwezayê jî, bi dehan zarok di bin malan de man û fetisîn, ev hemû gunehin û wê rojek bê wê kurd bighin mafê xwe û bi ser jî bikevin. Erdoxan ji bêhêzbûna xwe û şikandina wî ya li hember kurdan tu çare di destê wî de nemaya, tecrîdê giran dike li ser Rêber Apo, lê ne em û ne neviyên me doza Rêber Apo bernadin, lê hîn jî em deyndarê Rêber Apo ne û ez ji bo Rêber Apo ez xwe û zarokên xwe jî feda bkim hên jî kême, bi saya wî îro em azad bûn, heger Rêber Apo nebûya em ê heya niha bindestbana."



# Êrişên dagirkeriya Tirk yên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi giranî dewam dikin

Dagirkeriya Tirk di şeva 23'ê Cotmehê de careke din bi awayekî hovane dest bi êrişên xwe yên qirkirinê yên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir. Dagirkeriyê di êrişên xwe de wekî her car binesaziya herêmê û mal û milkên welatiyan dike armanc. Di encama êrişên ku heta niha dewam dikin, bi dehan welatî şehîd û birîndar bûne, stasyonên elketirîk, petrol, gaz, û gelek cihên xizmetguzarî hatin hedefgirtin û ji kar derketin.

**Navenda Nûçeyan**



Dewleta Tirk a dagirker di şeva 23'yê Cotmehê de bi balafirên bêmirov ên biçek û obîsan êrişên dagirkeriyê li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dan destpêkirin.

Artêşa Tirk a dagirker 23'yê Cotmehê bajarê Til Rifetê yê kantona Efrîn-Şehbayê topbaran kir. Di encamê de 4 welatî; Cemîle Weqas Xelîl (37), Melek Şiyar (5), Îbrahîm Şêxo (55), Mihemed Weqfî (47) şehîd bûn û 10 welatiyên din birîndar bûn. Ji birîndaran navên Ehmed Rîfahî (15) û Sakîne Mihemed Îsmaîl (55) hatin zanîn.

Dagirkeran gundên Şeala, Xirbe Şeala, Hirbil, Um Qura, Um Hoş, Şêx Îsa, Minix, Tinib, Şewarxe, Dêr Qaq, Semoqa û Bendava Şehbayê yên kantona Efrîn û Şehbayê dan ber topan. Her wiha derdora Kampa Serdemê ya li gundê Til Sosîn jî kir hedef. Di encamê de 2 welatî birîndar bûn. Ji birîndaran navê Ehmed Merwan Ehmed (65) hat zanîn. Hêjayî bibîrxistinê ye ku heta kêliya amdekirina vê raporê jê êriş dewam dikin.

**Kantona Firatê**

Li bajarê Kobanê yê kantona Firatê, balafirên bêmirov ên biçek ên dewleta Tirk a dagirker stasyona ceyranê ya li başûrê bajar, nuqteyên hêzên Asayîşê, firina li bajar, derdora hola Firatê ya li ser rêya Heleb-Cerablusê, derdora stadyuma Kobanê, embara genim a li gundê Rovî bombebaran kirin. Gundê Şiyûxa Jorîn ê rojavayê bajarê Kobanê jî bi obîsan topbaran kirin.

Dagirkeran gundên Mişêrfê, embara genim a Mişêrfê, gundên Dewalîb, Seyda, Mieleq, kampa Eyn Îsa, rêya M4, gundên Qizelî, Qirfelî, Um Hiweyîş, Xirbe Elûş, Erîda, Kor Hesen ên kantona Firatê bi çekên giran kirin hedef. Di encamê de ceyran li ser deverên navborî qut bû û firina nan ji xizmetê derket.

Artêşa dagirker navenda Hêzên Ewlekariya Hundirîn a li navenda bajarê Kobanê jî bombebaran kir. Di encamê de endamê Hêzên Ewlekariyê Henûş Bekê şehîd bû û 4 endamên din û zaroka bi navê Nadiya Mistefa (3) birîndar bûn. Di êrişa li ser embara genim a li gundê Rovî de karkerê embarê yê bi navê Hisên Deas şehîd bû û 7 karkerên din; Ebdureûf Mehmûd El Mihemed ê ji Reqa, Îbrahîm Mehmûd El Mihemed, Cîhad Cuma El Mihemed, Ehmed Mehmûd El Mihemed, Ebdullal Elî Mihemed, Elawî El Hisên El Ero û Mihemed Silêman Sikêfî birîndar bûn. Dewleta Tirk a dagirker di 25 cotmehê de têketina bajêr, gundê El Mişêrfe yê rojhilatê Eyn Îsayê, gundên Sayda û Maleq, rêya M4 û Kampa Eyn Îsayê bi hovane topbaran kir. wekî tevahiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê li ser vê kantonê jî êriş heta niha berdewam in.

**Kantona Minbicê**

Artêşa dagirker bi dehan caran gundên Seyada, Ewn Dadat, Toxar, Dirc, Dendeniyê, Ereb Hesen, Mişêrfê Biwêr, Qertwêran, Kawiklî û Hûtê û Biniyê yên kantona Minbicê kirin armanc.

Di êrişa li ser gundên Biniyê de ji malbatekê zaroka bi navê Fereh El Berho (11) şehîd bû û Ebdurehman El Berho (13) û Semîr El Berho (8) birîndar bûn.

Di 26 cotmehê de, di encama êrişa artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê ya li ser deriyê Ewn Dadatê de 2 zarok birîndar bûn. û heta vê kêliyê jî êriş dewam dikin.

**Kantona Cizîrê**

Navendên Hêzên Ewlekariya Hundirîn ên li taxên Enteriyê û Hilko yên Qamişloyê û navenda Hêzên Ewlekariya Hundirîn a li gundê Elî Fero ya li Qamişloyê, navenda tenduristiyê ya Xelîc ya li Hilkoyê, embara genim a li Enteriyê, derdora Hîzam a bakur, navenda belavkirina sotemeniyê (Sadkop) a li taxa Qenat Siwês, Şîrketa Pêşxistina Çandiniyê ya li Enteriyê û stasyona trênê hatin bombebarankirin.

Di bombebarana li ser navenda tenduristiyê ya Xelîc de zirarên madî çêbûn û navend ji xizmetê derket. Di êrişa li ser Şîrketa Pêşxistina Çandiniyê de nêzî 100 ton ard telef bû.

Her wiha derdora gundên Mêrga Mîra, Tebekê, Girê Vira, Bana Şikeftê û derdora çiyayê Qereçoxê, derdora bajarokê Rimêlan û gundê Eyn Tewîl bi balafirên bêmirov ên biçek hatin bombebarankirin.

Dagirkeran gundên Til Werd ê Rojava, Xirbe Şeîr, Rebîhat, Tewîle, Til Tewîl, Um El Kêf, Oce, Qebir Kebîr ê Rojava û Dawudiyê yên bajarê Til Temirê kirin hedef.

Stasyona ceyranê ya li bajarê Amûdê, firina nan a li gundê Hesen Romî yê rojhilatê bajarê Amûdê, navenda ceyranê ya li gundê Heremê Şêxo û gundê Hasda yên Amûdê hatin bombebarankirin.

Birca telefonan (Syriatel) a li gundê Kepez ê bajarê Dirbêsiyê hate hedefkirin. Di encamê de tora telefonan ji xizmetê derket.

Artêşa Tirk derdora gundê Girê Ziyaretê yê bajarê Girkê Legê jî hat bombebarankirin.

Stasyona gazê ya Siwêdiyê, stasyona komkirin û veguhestina petrolê ya Tifla ya li gundewarê Dêrikê, stasyonên Seîda, Ode, Babasî yên li gundên Kêl Hesnak, stasyona Zarbî ya li gundê Şemûliye, 2 cihên komkirina mazotê li nêzî gundê Girê Berê û 2 bîrên petrolê li Tirbespiyê hatin hedefkirin.

Di êrişa li ser stasyona Siwêdiyê de ku roja pêncşemê saet 02.30'an hatibû kirin de, 7 karkerên stasyonê; Mîzer El Hesen, Îsam El Sibêh, Etallah El Xidir, Beşar El Iwêd, Mehmûd El Hisên, Fadil El Xedan û Îlyas Îsa şehîd bûn. Her wiha bi dehan karker birîndar bûn. Ji birîndaran Feysel Ezîzî, Zahir Silêman Mihemed, Beşar Mehmûd Mihemed, Ebdulbaqî El Hisên, Husam El Ziyab, Ebdullah Mihemed El Mihêmîd, Ebid El Emûrî, Mesûd Xelîl, Hisên Mihemed Receb, Ebdulnasir El Mihêmîd, Mihemed Hemze El Hiso, Ebdullah Hisên Îbrahîm, Hemed Ehemd El Remo û Seedallah Ehmed El Hisên hatin zanîn.

Di saetên destpêkê yên îro (25 Cotmeh) de balafirên bêmirov ên biçek ên dewleta Tirk benda kontrolê ya Hêzên Ewlekariya Hundirîn a li ser rêya Eyn Dîwar ê gundewarê Dêrikê bombebaran kir. Gundê Gir Qehfik jî 3 caran hate bombebarankirin.

Di 25 cotmehê de dewleta Tirk û çeteyên wê ji baregehên xwe yên li bajarê Serêkaniyê yê dagirkirî, gundê Um El Kêf ê bajarê Til Temirê topbaran kir. Di êrişan de şêniyê bi navê Mihemed Delf ê 50 salî zaroka bi navê Emîne Xidir Hesîno (8) birîndar bûne û li nexweşxaneya bajêr tên dermankirin. Balafirên bêmirov ên artêşa Tirk a dagirker kargeheke çaksazkirina erebeyan li navenda bajarokê Rimêlanê yê kantona Cizîrê bombebaran kir. Hêjayî bibîrxistinê ye ku heta kêliya amadekirina vê raporê jî êriş bi giranî li ser Qamişlo û Dêrik berdewam in.

**Çalakiyên bersivdayînê yên QSD'ê**

Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) li hemberî van êrişan 2 çalakiyên bersivdayînê li dar xistin. Şervanên QSD'ê di çarçoveya bersiva li hemberî van êrişan li baregehên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê yên li derdora gundên Enîq El Hewa û Dawidiyê yên gundewarên Zirganê yên başûrê Serêkaniyê xist. Di encama çalakiyan de hejmareke leşkerên artêşa Tirk û çeteyên wê hatin kuştin û hejmarek birîndar bûn.

Şervanên Meclisa Leşkerî ya Minbicê û Hêzên Cebhet El Ekrad jî duh êvarê (24 Cotmeh) li baregehên çete û artêşa dagirker xist.

Di daxuyaniya hevbeş a Meclisa Leşkerî ya Minbicê û Hêzên Cebhet El Ekrad de hate diyarkirin ku baregehên Kerbeclî, Şawa, Şêx Nasir, Beldeq û Şêx Eqîl ên li gundewarê bakur û rojavayê kantona Minbicê hatin hedefkirin. Di encamê de kuştî û birîndarên çete û dagirkeran çêbûn.

Navenda Ragihandinê ya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) li ser malpera xwe ya fermî ragihand ku wê li dijî baregehên artêşa Tirk a dagirker ên li gundewarê bajarê Serêkaniyê yê dagirkirî 2 operasyonên serkeftî lidar xistine. Di encama herdu operasyonan de gelek leşkerên artêşa Tirk a dagirker hatine kuştin û birîndar bûne.

**Bêlanço**

Li gorî Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ragihandiye ku heta niha dewleta Tirk a dagirkern 685 caran êriş herêmê kiriye û di encamê de 17 şênî şehîd bûye û 48 jî birîndar bûn û bîlanço wiha ye: "
Êrişên balafirên keşfê: 99
Êrişên balafirên şer: 13
Topbaran: 573
Bi giştî dewleta Tirk 685 caran êriş herêmê kiriye.
Di encama wan êrişan de,
14 sivîl şehîd bûne
3 endamên hêzên leşkerî
Bi giştî 17 kes di bombebaran û topbarana dewleta Tirk de şehîd bûne.
Her wiha:
39 sivîl birîndar bûne
9 endamên hêzên leşkerî bûne
Bi giştî 48 kes birîndar bnye.

**Helwesta gel li hemberî êrişên dagirkeriyê**

Li hemberî êrişên dagirkeriyê yên herî dawî, gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê rabûn ser piyan û soza bilindkirina asta tîkoşînê dan. Welêtî bi girseyî tevlî meşên ku li dijî êrişan tên lidarxistin, dibin û helwesta xwe nîşan dan. Herwiha sazî, rêxistinên sivîl û partiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî li dijî êrişên daxuyaniyên cuda dan û bang rêxistinên navneteweyî kirin ku li hemberî êrişên qirkirinê ku dagirkleriya Tirk li dijî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dide meşandin, bêdeng nemînin û bi erkê xwe yê exlaqî rabin.

# Desthilatdarî û Rêveberiya Demokratîk...(2)

**Ji ramanê Rêber Apo**

Sosyalîzma pêkhatî hewl da pirsgirêka desthilatdarî û dewletê bi pêkanîna desthilatdarî û dewleteke din çareser bike û ev jî sedema bingehîn a îflasa wê ye. Sosyalîzma pêkhatî qet hesab nekiribû ku desthilatdarî û dewlet sermayeya kombûyî ne, wexta fonksiyonel dibin bi sermaye û kapîtalîzmê bi encam dibin. Di warê teorîk ê vê mijarê de çavkorî bû ye. Dewletdariya netewe ya navendî ji mînakên lîberal ên klasîk qat bi qat mezintir kiriye û yeqîn kiriye ku wê bi vî awayî bigihîje kominîzmê, lê di dawiyê de bi pêkhatina herî hov a kapîtalîzmê re rûbirû bûye. Encama herî girîng a ezmûna sosyalîzma pêkhatî ew e, sosyalîzm bê demokrasî pêk nayê. Di roja me ya îro de pirsgirêkên bi navê civaka sivîl, mafên mirov û hindikayiyan, pirsgirêkên rêveberiyên xwecihî û bi tevahî pirsgirêkên neteweyî yên klasîk gelekî zêde bûne. Ji ber ku dewleta netewe ya navendî xwerêveberî û demokrasî tepisandine, pirsgirêkên behsa wan tê kirin derketine holê. Ji lewra ji bo ev pirsgirêk bêne çareserkirin divê ew zemînê tepisandin û desteserkirina mafan ê dewleta netewe ji holê bê rakirin. Hem karekterê federal ê DYE'yê, hem jî xwebipêşvebirina Yekîtiya Ewrûpayê ber bi aliyekî ve ku pê nirxên demokratîk ên hatine desteserkirin hêdî hêdî be jî ji nû ve li civaka sivîl, ferd, hindikayî û rêveberiyên xwecihî vedigerîne, nîşan didin ku ji taktîk û teoriyên sêsed salî yên dewleta netewe çerx kirine, ji wan vegeriyane. Ji ber ku pêvajoya sêsed salî bi qasî ku di ti dema dîrokê de nehatibe dîtin rê li ber şeran, talanan, mêtingerî, qirkirin û asîmîlasyonan vekir. Mînaka Yekîtiya Ewrûpayê bi sînor be jî gavek e ku ber bi demokrasiyê ve hatiye avêtin. Çawa ku di modela dewleta netewe de jî hat dîtin, ev modela li demokrasiyê vekirî, îhtîmaleke xurt e, bi dewlet û gelên dinyayê re were parvekirin. Lê wer xuya dike ku bi awayekî bingehîn a li parzemînên din ên dinyayê pêş bikeve, demokrasiya radîkal e. Ezmûna Emerîka Latîn, nêzîkatiyên welatên berê yên sosyalîzma pêkhatî, rastiya Hindistan û heta Efrîkayê girîngiya demokratîkbûnê her roja diçe bêhtir nîşan didin û neçar dikin ku pêşketin ber bi vî alî ve pêk bên.

Li herêm û dayika niştiman a şaristaniya navendî kaosa mezin a pêk tê, ji her alî ve û eşkere nîşan dide ku parvekirina desthilatdarî û dewletdariya netewe bi binketine. Vê kaosê maskeyên desthilatdariyên xwe disipêrin hiyarerşiyên rehên wan kûr diçin û dewletên netewe yên Filistîn-Îsraîl, Iraq û Afganistanê anîne xwarê û vebirrî nîşan daye ku ew çavkaniya bingehîn a pirsgirêkan in, û dîsa ji her alî ve li pêş çavan raxistiye ku ew çavkaniya şîddet, teror, şer û tevkujiyê ne. Dewleta netewe û parvekirina desthilatdariyê mîna topeşeqê [bumerangê] vedigere li xwediyên xwe dide û ji bilî vê tiştek jê nayê û ev rastî jî têra xwe piştrast bûye.

Di van şert û mercan de hêza çareserker a demokrasiya radîkal û konfederalîzma demokratîk derdikeve holê. Li ser vê cografyayê şeveqa şaristaniyê avêt û jê re bû dergûş, vê carê jî şeveqa federalîzma demokratîk, demokrasiya rastî û radîkal diavêje û jê re dibe dergûş. Di xwezayê de rêzik û pîvanek heye: Her tişt li ser koka xwe ji nû ve hêşîn dibe. Wer xuya dike ku demokrasî jî wê li ser rehên xwe yên digihîjin şoreşa neolîtîkê bi temamî û bi awayekî serketî wê ji nû ve hêşîn bibe. Ev dergûşa ku hê jî derban ji şaristaniyên hegemonîk ên navendî hemûyan dixwe, pêkan e ku zarokê demokrasiyê xwedî û mezin bike. Ev çiya û erdên ji mêj ve hêza xwerêvebirinê, qabîliyeta civakbûna polîtîk û exlaqî ji dest dane, heye ku careke din, ji derketina 'Kurtî'yan a dergûşê û meşa wan re şahidiyê bikin. Li çanda Rojhilata Navîn her tişt mîsala kûpên bi ser hev ve kirî ne. Heqîqeta civakî ya li qadekê serketina xwe piştrastkirî, xwedî wê xisletê ye ku bi lez li qadên din belav dibe. Îslam di nava demeke kin a bi qasî sîh salî de bû sîstemeke dinyayê. Pirsgirêkeke piçûk a mîna Filistînê bi salan e ku fena tevahiya herêmê kiribe êsîrê xwe. Demokrasiya rastî ya bi şeveqa Kurdistanê re di dergûşa şaristaniyê de mezinbûyî êdî dikare gav biavêje û xweseriya demokratîk, konfederalîzma demokratîk û îfadeya sîstematîk a van diyardeyan tevan moderniteya demokratîk, weke alternatîfeke li dijî moderniteya kapîtalîst dest pê kiriye bi rolekê radibe. Li dijî sîstema moderniteya kapîtalîst a bi gelek dersên ibretwarî îflasa xwe her roja derbas dibe piştrast dike, moderniteya demokratîk mîna roja hiltê ye.



Di têkiliyên desthilatdarî, dewlet û xweseriya demokratîk de pirsgirêka bingehîn a divê mirov ji hev derxe ew e, divê cudahiyên di navbera xwe de çawa biparêzin û bi rêkûpêk bikin ango wê pirsgirêka aştiya civakî çawa çareser bikin. Em ji mînakên dîrokî û rojane dibînin ku kengî hewl didin hevdu bi temamî tesfiye bikin, desthilatdariya dewletê vediguhere cinawirê (Levîathan) civakî û pêvajoya kaotîk kûrtir û domdar dibe. Her ceribandina çareseriyê ya di vê çarçoveyê de hê bêhtir bêhnê li civakê diçikîne û wê diqedîne. Ji çaresernebûnê mirovatiyeke bûye mîna moriyan a di bin îdareya mutleq a dewletê û qalibên zêdexwarin-bikaranînê de asêmayî paşve dimîne. Ev rastî bi êrişên topyekûn a moderniteya kapîtalîst li dijî civakê pêk hatiye. Şoreşgertiya nikarî ji utopîkbûn û desthilatperestiyê bibihure, bi van qelsiyên xwe bûye sedem moderniteya kapîtalîst bêhtir bi hêz bibe.

Xweseriya demokratîk a hêza çareseriyê ye, bi du cure rêbazan dikare bi van avahiyên dêwane re serî derxe. Rêbazên şoreşger û reformker. Rêbaza şoreşger a bi tevahî xirakirina avahiyên moderniteya kapîtalîst, nexasim desthilatdariya dewlete netewe dike armanc, ji ezmûnên wê yên dîrokî jî diyar bûye ku desthilatdariya dewleta netewe bi hêztir kiriye û bi ser neketiye ku avahiyên wekhevî, azadî û demokratîk ên civakê ava bike. Demokrasiya reformker jî di nava moderniteya serdest de heliyaye, nikarîbûye xwe ji vê aqûbetê rizgar bike. Encama em ji vê bigirin ev e, çi rêbaz were bikaranîn bila were bikaranîn, ya esas ew e, divê mirov alternatîfên entelektuelî û sazîyî yên sîstema moderniteya demokratîk pêşde bibe di rojevê de bihêle û bi cih bîne. Divê mirov karibe texmîn bike ku herdu sîstemên moderniteyê, dibe ku bi sedsalan li cem hev bimînin, û li gorî vê, mirov hem di binyeya dewleta netewe ya taybet de, hem jî di nava sîstema jornetewan a gerdûnî de çareseriyên destûrî yên demokratîk pêş bixe û bi îhtîmaleke xurt, pêkan e ku ji têkilî û nakokiyên di navbera xwe de bibihurin. Pêşketineke bi vî rengî dikare rabihuriya neyênî bigihîne paşeroja erênî.

# Erdogan çima, şimika xwe xist nav şekala Îsraîl û Ereban

**Volqan Elî**

Sedsala 19. ku Kongreya Yahûdiyên cîhanê kom. Di vê Kongreya navbûrî de biryar tê girtin ku ji Yahûdiyan re dewletek were avakirin. Girêdayî bi vê biryarê, gelek cih tên diyarkirin ku ji wan re bibe war. Ji van çend cih di nava sînorên împaratoriya Osmanî de bûn. Filîstîn, Îzmîr-Manîse, Selanîk... vê daxwaza xwe radigihînin Siltan Abdulhamît lê ev nayê qebûlkirin. Dema ku qebûl nake, bi rêya Îtahat ve Terrakî li dijî wî, ji beriya şerê cîhanê yê yekemîn derbe dikin. Dîsa di şerê cîhanê yê yekemîn de destpêkê Yahûdî destekê didin eniya împaratoriyên Alman-(Osmanî di vî şerî de li cem Almanyayê bû). Lê paşê desteka xwe ji Almanya dikişînin, alîkariyê didin Brîtanya. Di encamde eniya Alman şerê cîhanê wenda dike. Ne hemû sedem ev be jî, ev faktoreke girîng e. Dema eniya Alman vî şerî wenda dike, vê wekî neheqiyeke li wê hatiye kirin dibîne. Jixwe Almanyaya Hitler jî vê dike sedem di pêvajoya şerê cîhanê duyemîn de jî bi sedhezaran Yahûdî di firinan de dişewitîne, di odeyên gazê de dixeniqîne.

Ji beriya vê di kongreya 1892'an hin cihên kongreyê wekî welatê Yahûdiyan fikirîbû. Dema ku bi şerê rizgariyê yê Mustafa Kemal, Tirkiye girt, hêzên hegemon Tirkiyeya Mustafa Kemal bi îhtimaleke mezin ji ber vê yekê wekî Îsraîla pêşwext erê kir. Dibe ku ji ber vê yekê, hêzên hegemon dengê xwe ji bo jenosîda Ermenan nekiribûn. Di encamê de Osmaniyan milyonek û nîv însanên Ermen qetlkirin. (ev amadekariyên Îsraîleke li ser erdên Anatoliyê bû) Vayê heman Tirkiyeya Mustafa Kemal, piştî ku ew mir, piştî şerê cîhanê yê duyemîn ji welatên destpêkê bû ku Îsraîl nas kir. Ya din jî Tirkiyeya Mustafa Kemal dema ku hate ava kirin, ji ber ku li ber Sowyeta Komînîst bendeke xwezayî bû dewletên kapîtalîst ên hegemon rê da wê ku bijî.

Dema ku piştî şerê cîhanê yê duyemîn Îsraîla rastîn ava bû, û ya din jî Yekîtiya Sovyatê di salên 1990'an hilweşiya; ji ber ku gefa komînîzmê ji ser emperyalîstan rabû û Îsraîl bi xwe ava bû yanî pêwîstî bi Îsraîla pêşwext a îhtimal bû li ser erdên Tirkiyeyê avabûya nema, êdî hêzên hegemonîk difikirin ku pêwîstî bi Tirkiyeya Erdogan ku li ser erdên Osmaniya Abdulhamît ava bibû, nemaya.

Taybetmendiyeke esasî ya Yahûdiyan jî ew e ku ti car tola xwe li ti kesî nahêlin. Di serdema navîn de dema ku îspanya û Fransa li wan neheqî kir, çûn Hollanda-Îngîltereyê pêşengiya kapîtalîzmê kirin. Fransa, Îtalya, Almanya ji aliyê aborî û siyasî ve di wê serdemê de di pey Holland-Brîtanyayê re xirikî. Abdulhamît Xanê Osmanî, yanê bavpîrê Erdogan, dema teklifê Yahûdiyan qebûl nekir, ji beriya şerê cîhanê yê yekemîn ji textê xwe bû. Dîsa ji ber hin hesabên wê demê, dema di vî şerî de desteka xwe ji Almanya kişandin. Ev jî bû sedem ku Almanya di şer de têk biçe.

Lê wisa xuya dike ku hesabê Yahûdiyan li gel Osmaniyan neqediyaye. Jixwe wê demê tenê bi destê Îttîhat ve Terrakî Abdullhamît ji textê wî kiribûn. Me got taybetmendiyeke Yahûdiyan e ti car ji pêkanîna armanca xwe dest bernadin, ev Osmaniyên Nû bin jî wisa ye, (Erdogan bi xwe dide pey armancên Osmanî) Di encamê de hem hesabên hêzên hegemonîk ên derveyê Îsraîl û hem jî li gorî hesabê Yahûdiyan êdî zêde pêwîstî bi Tirkiyeya Erdogan nemaye.

Ya dawî; jixwe di pirtûka pîroz a Yahûdiyan de nivîsandiye ku bihûşt di navbera çar çeman de ye. Em îro dizanin ku ji van yek Firat û ya din jî Dîcle ye. Îsraîl dewleteke teokratîk e yanî li ser esasê dînê Yahûditiyê hatiye avakirin. Çawa ku mumînê her dînê ji bo dîna xwe dixebitin, ji bo bihuşta xwe dua dikin û heta şer dikin Yahûdîtî û Îsraîl sed hezar carî zêdetir wisa ye.

Serçavên Dîcle û Firat di binê potînên leşkerên Erdogan de ye; xewnên Netanyahû pê gur geş dibin. Kurdistana qedîm wekî hezar salan bûye dîsa amadekariya şerekî xwînavî dike. Lê mixabin ne ji bo xwe...

Tenê pêşiya şerekî wisa xwînavî, dikare bi Konfederalîzma Demokratîk were girtin. Wê demê pêwîstî pê namîne ku Erdogan bide li pey Mîsaqa xwe ya Milî, bihuşta li Tewratê jî jixwe her li şûna xwe ye, Kurdistana tije xêrûbêr. Ew têra gelê Tirk, Yahûdî û Kurd, Ereban jî heye. Lê em soza Erdogan nadin ew dikare biçe Asyaya Navîn (li gorî hin gotinan ne Tirk e, Gurcî ye) yan eger neviyên Cengîz Xan wî qebûl nekin bila berê xwe bidê Gurcistan. Êdî wê demê ew dizane biçe ku derê.



# Dilyar Cizîrî: Ragihandina Azad hêza dildarî û rastiyê ye

Dilyar Cizîrî diyar kir ku Ragihandina Azad bi hêza civakê girêdayê ye, lê ragihandinên dîtir bi hêz pereyan ve girêdayî ne, herwiha xebatkarên ragihandina azad bi dildarî kar dikin, dibin mertalek li hemberî hêza desthilatdaran û di vê oxirê de 28 xebatkarên ragihandina azad xwe fedayî heqîqetê kirin.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Derbarê rola Ragihandina Azad û cûdabûna wê ji ragihandinên dîtir Hevserokê Ragihandina Azad Dilyar Cizîrî bersiva pirsên rojnameya me da û hepeyvîn wiha bû:

**Ragihandina Azad dîrok û bingeha xwe ji kur digire?**

Heger em behsa ragihandina kurdî bikin, bi giştî em ê bingeh û dîroka ragihandina kurdî bi Serxwebûnê ve girê bidin. Serxwebûn yekem rojnameya ku ji aliyê Tevgera Azadiyê ve di salê 82'an de hate derxistin û weşandin. Tevî ku berî Serxwebûn ragihandinên kurdî hebû, bi rengekî sivik tev digeriyan, lê bi Tevgera Azadiyê re qada ragihandinê hinekî geş bû, di heman demê de xebatên çapemeniyê zêdetir ketin meriyetê de. Di salên 83'an de Kovara Berxwedan li Ewropa weşan dikir, ropelekî wî bi zimanê erebî ku nivîsên wê yên Rojava bûn, dihat weşandin, ev kovar li Ewropa çap dibû li vir dihat belavkirin, ev xebat bi rengekî veşartî li Rojava dihat meşandin. Piştî salên 90'î Tevgera Azadiyê hîn zêdetir bal da ragihandinê, êdî kovarên dîtir dihatin çapkirin, bi taybet wekî navendekî çapkirin van kovaran Lubnan bû. Li Lubnanê kovara Rojhilata Navîn, Sorgul û hinek kovarên dîtir derketin, ev kovar derbasî Sûriyê dibûn û ji Sûriyê dihat Rojava belav dibû, lê belavbûna van kovaran gelek zor û zehmet bû, ji ber dema ku bi kesekî/ê re hatiba girtin ji aliyê rêjîma baas a wê demê dihatin cezakirin. Ji derveyî Tevgera Azadiyê, her partiyek kovareke wan a taybet hebû û tenê bi zimanê xwe yê partiyê weşan dikirin. Herwiha bi geşbûna Tevgera Azadiyê li Rojava û Sûriyê di salên 84'an de, êdî xebatên ragihandinê derbasî qada Rojava jî bû.

**Ragihandina Azad çawa dikarî bingehekê ji xwe re ava bike û di çi qonaxan re derbas bû?**

Ragihandina aktiwel a nûçegihanî ya bêtirî xwe tiştên rojane ku bibin nûçe, bi weşana MED TV re di sala 1994'an de, di asta Kurdistanê giştî de dest pê kir, ev yek hêdî hêdî ji bo Rojava jî bandor kir û bernameyên MED TV li vir jî hatin çêkirin. Piştre bû Mediya TV, Roj TV, Stêrk TV û gelek kenalên din.



Kenalên ku hatin vekirin bandora xwe ji bo Rojava jî hebûn û xebatên ragihandinê li vir êdî berfireh bû, hem jî bi awayekî aktiwel nûçe nûçegihanî çêbûn, lê di aliyê pêşeyî û gav avêtinê de zehmetî hebûn, ji ber tê zanîn ku rewşa Sûriyê wê demê di çi astê de bû. Li tevahî Sûriyê xebatên ragihandinê derveyî ên desthilatdaran tinebûn û kesên ku xwendina ragihandinê jî qedandibûn, bê çarebûn ku di nava ragihandina rêjîmê de bixebitin, ji ber derveyî wê tu xebatên çapemeniyê yên serbixwe û muxalif tinebûn. Ev rewş bandor li Rojavayê Kurdistanê jî kir, lewra di nava xebatên ragihandina kurdî de piraniya wan ne rojnamevan bûn û xebatên ragihandinê didan meşandin, him ev xebatkar dîmen û nûçe ji navenda televîzyonê re dişandin û pêre jî xebatên nivîskî ên kovaran dikirin. Piştre radiyo hatin vekirin mîna radiyoya Mediya li Rûsiya, Mezopotamiya dengê Kurdistanê vekirina wan jî bandoreke mezin kir.

Ew rewş heta sala 2008'an dewam kir, di Newroz 2008'an de peyama KCK Rojava hate ragihandin. Beriya ragihandina KCK amadekarî jêr hatibûn kirin û yekem konferana ragihandinê di sala 2007'an de bi awayekî veşartî hatibû lidarxistin, di wê konferansê de biryara pêxistina di aliyê pêşeyî hatibû dayîn. konferansa duyemîn a ragihandinê di sala 2009'an de hat lidarxistin, di wê konferansê de biryar hatin standin ku xebatên ragihandinê hîn zêdetir pêşeyî be û karibe bandorê li belavkirina doza kurdî û pênasekirina dinyayê bike. Pêşxistin xebatên ragihandinê li Rojavayê Kurdistanê bi vî rengî dihat meşandin.

**Şoreşa Rojava derfeteke çawa ji bû pêşketina ragihandinê da avakirin?**

Buhara gelan a ku ji Tûnsê dest pê kir, derbasî Sûriyê jî bû. Di vir de firsendek bû ku di xebatên ragihandinê de hîn zêdetir gav bên avêtin û berfireh bibe. Zemîna ku hatibû avêtin weke Serxwebûn, MED TV, Roj TV û hwd... bibû zemînek ji bo xebatên ragihandinê ku şoreşa 19'ê Tîrmehê li ser ava bibe. Herwiha bi serhildan û xwepêşandanên ku li Sûriyê dest pê kir, gavên pêşxistina ragihandina şoreşê hat kirin, yek ji wan pêşxistinan destpêkirina Rojnameya Ronahî di sala 2011'an de, herwiha di xebatên Ajansa ANF'ê de beşê erebî vebû, piştre di sala 2013'an de bû ANHA, wê demê pêwîstî bi xebatkaran hate kirin, da ku karekî zengî bê kirin. Konferanên ku di sala 2007 û 2009'an de hate meşandin zemînek bû ku xebatkarên wê li bajaran ekîban ava bikin, him ew ekîb kar bikin û perwerdeyan jî bibînin, ev yek bi derfetên herî kêm dihat kirin. Herwiha di nava 2 salan de ekîbên ragihandinê yên dîtbarî û nivîskî hatin avakirin û xebatkar çêbûn, di nav de êdî weşangerî dest pê kir, wek 2012'an Ronahî TV dest bi weşanê kir. Lê dîsa jî ji bo gihandina dîmenekî kedeke mezin dihat dayîn, kamîre tinebûn ciwanên ku kamîrevanên şahiyan bûn, bi wan kamîreyan dîmen dihatin kişandin û bi kombiyoterên wan dîmen dihat dîzayînkirin. Civak jî beşeke mezin ji pêşxistina xebatên ragihandinê bû.

**Ragihandina Azad çawa dest bi xebatên ragihandinê kirin û roja îro di çi astê de ye?**

Ji sifrê xebatkarên ragihandina kurdî dest bi xebatên ragihandinê kirin û bi riya perwerde û pratîkê fêr bûn. Bi saya wê kedê jî, îro roj bi dehan saziyên ragihandinê li Rojava bey ku tu kes ji derve di nava de be, weşan dikin. Herwiha li Rojavayê Kurdistanê, Bakur û Rojhilatê Sûriyê zemînekî baş ji bo ragihandinê hatiye avakirin û zêdeyî 86 saziyên ragihandinê bi herêmî û navdewletî hatine destûrdan. Ya herî bi wate jî di wan saziyan de ciwanên vê xakê xebatkarên wê ne, ev yek jî encama têkoşîna ku hate kir. Di vê oxirê de 28 xebakarên me canê xwe fedayî heqîqetê kirin û bûn şehîdê ragihandin azad. Bi wan gavên ku îro hatine avêtin, derfetên ku ji bo xebatkarên ragihandinê hatiye vekirin encama ked û têkoşîna wan e, heger îro em dikarin birehetî karê ragihandinê bidin meşandin bi saya ked û têkoşîna wan e. Şehîdê herî zêde rol û bandora wî hebû şehîd Seyid Evran bû. Seyid Evran ji destpêka şoreşê berê xwe da vê qadê û li hemû bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê geriya û ji sedî 90 endamê ragihandinê perwerde kirin, di heman demê de ezmûna xwe bi wan re parve kirin, ji bo wê jî em rêzdarî bi bîr tînin û em dibêjin heger îro ragihandinekî bi hêz li vê derê hebe ew bi saya têkoşîn û keda te ye.



**Çi cudahî di navbera Ragihandina Azad û ragihandinên dîtir de ye?**

Hin dibêjin ragihandina azad çi ye û ev têgîn ji kur anîne. Niha cudahî di navbera Ragihandina Azad û ragihandinên din de ew e ku ragihandinên dîtir bi hêza pera ve girêdayî ne, çend rojan xebatkarên wan peran negirin ew sazî wê bela bibe. Lê xebakarên ku dest bi xebatên ragihandina azad kirin, bi dildarî tevlî bûn. Herwiha xeta weşana ragihandina azad xeta dengê gel û civakê ye. Ragihandina me ya azad li hemberî desthilatdariyê dibe mertalek, da ku civaka me denê xwe nas bike. Xeta weşana ragihandinên din tenê di xizmeta desthilatdaran de ye. Heta niha mûçeyên ku xebatkarên ragihandina azad werdigirin têra pêdiviyên jiyanî neke, lê ji ber armanca wan ne perene, armanca wan dengê gel e. Dildariya wan jî nasnameya azadbûyînê dide pêş. Ragihandina Azad li hemberî saziyên şerê taybet bi pênûs û qelema xwe şer dikin, ji ber saziyên şerê taybet antîpropoganda dikin û dixwazin gavên ku hatine avêtin biçûk bikin, lewra reşkirinê dikin, li beramberî wê ragihandina Azad wê yekê rast dike û raya giştî ya civakê ava dike. Ev xebat dibe ku ne bi hesanî hate kirin û roj bi roj xwe li pêş dixe, lê heger xebatkarên ragihandina azad dengvedana şoreşa 19'ê Tîrmehê, kêliyên berxwedana gel û şervanan û serkeftinê belge nekirbana, wê ew serkeftin li cihê xwe maba û dinayê dengê Kobanê nedikir û sîstema Rêveberiya Xweser nas ne dikirin.

**Gelek êriş li ser qada ragihandinê tê kirin, ragihandina azad çiqasî kare bibe bersiv li hemberî van êrişan?**

Niha em xwedî fikir û felsefe ne, di demekî ku cîhan kirîzekê jiyan dikin, fikir û felsefeya me çareseriyê nîşan dide. Lewra ji aliyê dewleta Tirk bi hevkariya PDK'ê xebatkarên heqîqetê dibin hedef, dewleta Tirk her li dijî ragihandina azad şer dike, ev jî ji bo tenê ragihandina wê ya şerê taybet li ser civakê bandor bike û aliyek tinebe ku wê rastiyên heyî ji civakê re eşkere bike, ji bo wê ji ragihandina azad ditirse. Herwiha ji bo razîkirina dewleta Tirk, PDK'ê rojnamevanên li Başûr dike armanc. Hikûmeta Şamê jî rojnamevanên di nava Sûriyê de yê ku rastiyan eşkere bike, bincav dike. Bi yek zihniyetê planan li ser ragihandina azad didin meşandin û naxwazin ku ragihandinek nûnertiya civakê bike, ji bo wê êriş li ser ragihandina azad pêk tên, lê carî jî bi ked û saya şehîdên xwe karîbû gavên mezin bavêje û qadekî ragihandinê ya bihêz ava bike ku zêdeyî hezar û 700 xebatkar di vê qadê de cih digirin. Serkeftina herî mezin jî, ji sedî 60 xebatkarên jin in. Yê ku niha pêşengtiya ragihandina Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike jin e ku di nava şoreşa Jin, Jiyan, Azadî ragihandina jin li pêş e. Ragihandina ku bi kurdan dest pê kir, îro roj ragihandinê her pêkhateyî heye, da ku her civakeke rengê xwe nîşan bide, ev serkeftineke ji bo tevahî gelê Sûriyê.